

# BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELËN KURDISTANË LI SWËD



## KOVARA FEDERASYONA KOMELEN KURDISTAN LI SWED

## NAVEROK

Jî bo Federasyonek xurtur ber bi pêş.....	3
Biranina Komara Mahabad.....	7
Kurd (KURDOX).....	8
Nameyek jî bo Seydayê mezin Cegerxwin.....	9
Mamosta Eladin Sucadi çû ser heqya xwe.....	11
NEWROZ bî şahiyeki mezin hate pirozkurun.....	12
Çend gotin ser Konferansa Stockholmê .....	14
Pîrsen zarokên kurd .....	16
21 Sîbat roja dijayetiya kolonyalzmê .....	17
Çend berhevok derheqa kurdan.....	18
Tahir û Zar.....	19
Helbest.....	20
Jî bir û raya giştî re.....	21

Berpîsyar  
A. BAWER

Pergala Rûpelan  
M.A. GILLY

Raxistina Nivisaran  
SELİM

Redaksiyon;

H. ARAS  
ROJHAT  
F.REZAO  
BIRİNDAR  
M.A. GILLY

**BERBANG**  
Kurdisk tidskrift, utges av  
Kurdiska Riksforbundet. Ansv-  
arlig utgivare och Redaktör:  
**A.BAWAR**. Layout: A.M. Gilly.  
Sattnings: SELİM

**ADRESS**  
Kurdiska Riksforbundet,  
RISSNELEDEN 55,NB  
172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN  
TEL:08/984553

Prenumeration. Medlemmar  
50 . kr/år Övriga 100 . kr/år.  
Postgiro. 64 38 80-8

## Xwendevanê n hê ja,

Pîştî kongra Federasyona Komeleñ Kurdistan Li Swed ya 5'an, hejmara yekem ji xwendevana ra pêşkêş dikin. Vê hejmara hanê hinek derengi ket. Lî, dereng ketina vê hejmare jî sedemên tekniki û kurtayiya wexte. Jî ber ku kongre wê dî meha Heziranê da car din çê bibe.

Em hêvidarın, ku wun li me negrin û alikariya xwe ji Berbangê ra nişan bîdîn. Jindariya her kovareki girêdayî alikariya xwendevan û niviskaraye.

BERBANG

**BERBANG**

Kovara Kurdi, Xwedi Federasyona Komeleñ Kurdistanê  
Li Swed.  
Buha: 5 Kron.  
Abona saleke: 50 Kron, 30 DM.

**NAVNIŞAN**

Berbang, Rissneleden 55.NB  
172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN  
Tel: 08/984553  
Postgiro: 64 38 80-8

# JI BO FEDERASYONEK

# XURTTIR BER BI PES

Dı dema iro da, bı sed hezaran kurd lı welatên Ewrûpayê Ciwar bûne. Ew ji ber sedemên abori û siyasi ji welatê xwe derketine. Problemên wan ji, her wusa cûre-cûre ne. Mirov dikare van probleman weha bı rêz bîke:

— Serê her tiştî, ew mirovên welatek mêtîngehin. Belangazi, birçibûn, bekari û paştamayı rolek giring dileyize dî jiyana wan da. Jı bo gelê kurd problemê herê mezin ev rewşê. Dı welatê biyani da ji, ev zerp bı her hawayi xwe dide xuya kırın.

— Jı sedemên biyanityê û kulturnen cihê, tesirek psikolojik û dilsariyek peyda dibe.

— Problemeke mezin ji, tûrsa qebûlnekirina heqe rûniştandinê û bê kar mayinê ye.

— Jı xêni van sergêjayiyan ew herin kija welatê Ewrûpayê ji, ji çerxa kedxwariyê xelas na-bin.

Lê gelek kurd dı welatê Ewrûpayê da ji ali çandi, ciwaki, sosyal û ziman da xwe nû dikin û pêş da diciñ. Gelek ji

wan rêya tekoşeri û welatparêzi lı van dera fêr dibin û di xebatê weha da cih digrin. Bı çi hawayi dibe bila bibe, lı hember dujmîn danasina rêya tekoşinê û karên rexistini gavek pêşketinê ye û tewgerek giringe.

İro dı Kurdistanê da ji, di welatê Ewrûpa yê da ji, du rê lı ber me heye. yan mirov ji hertiştî ra bê deng dîmine û rizang û bêkêr dibe, yan ji, diji zordariyê rêya tekoşeriyyê hildibjêre. Dı nav van herdu rêyan da rêki din tune. Hilvesandina sazûmana zordariyê bı tekoşin, karên rexistini û hevkariyê ye. Wextê, ku em rewşa welatê xwe, zulm û teda ya cunta faşist binin ber çav, giringiya karên rexistini û hevkariyê, bêtir xwe bide xuyakırın.

Lı Swêd ji, di navbeyna 5-6 hezar kurd ciwar bûne, di karên siyasi û demokratik da cih girtine. Jı van karên hêja yek ji, damezrandina Federasyona Komelêن Kurdistan lı Swêd e. Bîngeha Federasyona Komelên Kurdistan berya 5 sal berê hate avêtin û gelek komalên Kurdistan

tanê tevi bir û baweriyêne xwe yên cihê dı bin vê navê da hatîne kêleka hev. Bı rasti ev xebat gaveke pêşketi û xizmetek hejabû. Dı vê wari da watiniyêne ku dikeve ser milêne me, xurtkîrin û firehkîrina vê rîxis-tinê ye. Gava, ku em dı xebatêne demoqratik û siyasi da mil bîdin hev wê zêdetir tekoşina gelê me pêşkeve û wê zêdetir pîrsêne gelê Kurd dı nav gelan da belav bibe. Dı gel viya ji, pîrsêne me yên vê derê wê bî hêsa-ni çare bê lêkîrin. Dı Swêd da ji bo standina mafêne demoqra-tik, çandi, ziman û hwd. dîvê Federasyona Komelên Kurdistan lı Swêd bê çalakkîrin û xurtkîrin. Em lı Swêd dikarin gelek olaxan bî kar binin, lı ser çand, ziman, sinet û mafêne radio-Tv û hwd. Wek, ku me lı jor ji got, evya gîrêdayî hevkariyê ye. Jı ber vê yekê, ji bo karên demoqratik bila şîara me xurtkîrin û bî hêzkîrina Federasyona Kurd be!

Kongra Federasyona Kome-lên Kurdistan lı Swêd pêkhat. Roja 17 Çiriya Paşin 1984'an da kongra civiya. Lê, kongrê da

piraniya nûneran çê nebû. Jî ber vê yekê, kongra dî roja 26-27/1/1985'an da civîya. Jî bo meşandina kongrê diwan hate hilbijartın û rojeva kongrê hate qabûl kîrûn.

Rojeva kongrê bî vi tehri bû:

- 1— Hilbijartına diwanê
- 2— Bijartına nûneran
- 3— Axaftına serok
- 4— Axaftına mîvanan
- 5— Rapora Komita Çavder
- 6— Rapora Xebatê.
- 7— Rapora Abori
- 8— Rabezrin lî ser raporan
- 9— Guhartına Destûrê.
- 10— Rûspikirin
- 11— Hilbijartına Organên Nû
- 12— Bîryarê Kongrê
- 13— Pêşneyar û Girtuna Kongrê

Komita karker raporêن xwe yêن salawexti pêşkeşê kongrê kîrûn. Lî ser raporan rabezrin çêbû. Û komita karker hate rû-spikirin. Pişti wi ji hemû kome-lêñ, ku dî kongrê da besdar bûbûn komita karker ya nû hate hilbijartın û gelek bîryarêñ gîring hate qebûlkirin. Bîryarêñ, ku dî kongrê da hate qebûlkirin:

\* Iro lî cihanê leceke mezin dî warê çek-silahan da dajo, Reagan, hêzên êrişkar wek NATO û yêñ mayin dixwazin şereki nûh derkeve. Kongra me vê yekê wek belake mezin dibine. Iro, çekêñ atomik her diçin zêde dibin, aşitiya hemû cihanê û mirovatiyê ketîye nav tengasike mezin. Kongra me bawer dike weki ev mesrefen ku ji bo çek-silahan dibin, dikare hemû mirovên vê cihanê têr bîke. Kongra me lî diji van şerîn nûh radîweste û cihê xwe lî bal hêzên aşitixwaz digre.

\* Kongra me lî diji imperyalizmê, diktatoriyêñ êrişkar radîweste û tekoşina gelên bindest silav dike. Kongra me alikariya tevgerêñ bindest dike.

\* Kongra me lî çar besên Kurdistanê piştgiriya tekoşina gelê kurd dike û hertim lî bal vê tekoşinê ye. Jî bo danasina vê tekoşinê di nav hemû hêzên demoqrat, pêşverû û aşitixwaz da, kongra me alikariya van hemû karan dike. Kongra me alikari û piştgiriya gelê kurd wek berpîrsyarîke dibine.

\* Ew rejimên ku Kurdistan dî nav xwe da bes kirine, ew rejimên kevneperest, rejimên Türk, Ereb û Faris bî taybeti lî ser gelê kurd, wusan ji lî ser gelên navçê zordesiyêñ bê-hempa pêkanine. Kongra me hemû van zordesiyêñ kevneperest û faşist protesto dike û lî bal van gelan û tekoşina wan cih digre.

\* Lî Kurdistanê di nav hêzên welatparêz da car-carna nebaşî û şer peyda dibin, ew çek-sila-han dikşinîn hev. Ev yeke birasti zîrareke mîzin dîghine tekoşina gelê me ya rîzgariya netewi. Hemû ev karana kêri dijmin têñ û wan kêfxweş dike. Jî bo pêşketina tekoşina gê-lê me, Kongra me sekinandina van şeran pêwist dibine.

\* Iro lî Kurdistanê, lî her beşeki tevgerêñ cihê lî hemberi biyaniyan û kevneperestike mezin lî diji karkerêñ biyani tê ajotin. Kongra me ji bo sekinandina van karêñ njatperestiyê tekoşin dide û dostayetiya gelan dixwaze

\* Lî her çar perçê Kurdistanê hemû hêzên welatparêz pêwiste, bî hemû hêzên şoreşvan û democrat yêñ wi welati va dostayeti û hevkariyê pêk bine. Kongra me dixwaze vê dostayeti û hevkariyê dî pratikê da bibine.

\* Dî nav rêxistinanda car-car na hm dubendi û nexweşî peyda dibin, hemû ev pîrsên hunduri pêwiste bî xweşî û metodêñ iknaê va bêñ çarelêkirin. Metodêñ zorê riya xelasiyê ni-

ne. Lî Ewrupe kuştina hin keßen welatparêz me dîlteng û xemgin dike, kongra me van metodan xelet û şaş dibine.

\* Cuntaya kolonyalist û faşist lî Tirkîyê, bî imperialistên Emeriki va ketiye nav hevkarike mezin. Ev hevkari dixwaze lî Kurdistanê û wusan ji lî navçê zora hemû tevgerêñ lî diji impêrializmê, tevgerêñ gelên bindest bîbe, wan bend bîke. Jî ber vê yekê, ew dixwazin "Hêzên Bi Lez" lî Kurdistanê ciwar bîkin, cîgehêñ nûh bîdin ber destêñ Emerikayê û fuzyeyêñ nuklerê lî vê hêlê ciwar bîkin. Kongra me hemû van planêñ tari û sosret protesto dike. Lî aliyê din, êrişkariya hukmetêñ Türk lî perçeyêñ Kurdistanê yêñ din, bî taybeti ketna ordiyêñ Türk, Kurdistanâ Iraq û Iranê protesto dike.

\* Lî Ewrûpê iro lî gelek we-latan njadperesti, dijayeti lî hemberi biyaniyan û kevneperestike mezin lî diji karkerêñ biyani tê ajotin. Kongra me ji bo sekinandina van karêñ njatperestiyê tekoşin dide û dostayetiya gelan dixwaze

\* Çawa tê zanin iro gelek multeciyêñ politik têñ lî Swêdê û mafê rûniştandinê distin-nin. Kongra me, jî ber vê yekê kêfxweşiyêñ xwe diyar dike. Jî aliyê din gelek rêxistin, sazgehêñ pêşverû û democrat pişgiriya gelê Kurdistanê dikin û alikariya xwe nişan dîdin.

Iro lî Kurdistanê lî ser çand, ziman û hebûnêñ gelêri zordes-tike şovenist dajo. Lê lî Swêdê ji bo zarokêñ kurd mafê ziman tê dayin, çanda gel bîserbesti pêşta diçe û dî vi wari da gelek kar û xebatêñ hêja pêk têñ. Kongra me vê yekê wek pêşkîneke pozitif dibine.

Kongra me wusan bawer dike weki ev karana pêwistin bêñ zêdekirin û başkırinê. Dî vi wari da alikariya gelê Swêdê me

gelek kêfxweş dîke.

\* Çawa tê zanin iro lı Swêdê gelek neteweyên cuda dijin û gelê kurd ji, ji van netewan yekê. Jî bo xurtkirina dostanetiya navbera gelê Swêd, Kurd û gelê mayin yên pêşverû û democrat, kongra me zêdekirina xebatan hêvi dîke û lî diji dijmîatiya biyaniyan pêwiste em dengê xwe bilind bikim.

Kongra me mafêñ radyo û televizyonê bî zimanê kurdi pêwist dîbîne. Jî bo van mafan, kongre bî çalaki xebateke xurt dixwaze.

\* Me sala çûyi sê kurdê welatparêz, pêşverû û mirovperwer wunda kir. Her sê kurdê dilşewat, Tewfiq Wehbi, Yilmaz Guney û Cigerxwin ji xebatek bêhempa û bilind da. Digel vana sosyolog û tekoşerek mezîn İsmail Beşikçi, ji ber nivisê, ku lî ser Kurdistanê nivisiye, hê ji lî girtigeha faşistta ye.

Kongra me ev çar kesen mezîn û xabata wan ra hurmeta xwe pêşkêş dîke û wan jî bo endamtiya şerefê hildibêre.

\* Konra me ya pêncan, silavêñ germin û şoreşgeri ji pişmergeyên, ku diji dijiminê dagirkir şer dîke, bî rê dîke.



# SILAVNAME

## Jİ BO KONGRÊ

Jî Konra 5'an ya Federasyona Komelêñ Kurdistanê lî Swêd re.

Em dî rêngora we ya 5'an de serketin û serfirazi dixwazin.

Em hêvidar in dî pê şerojê de hûn di kar û barêñ xwe de bi serkevin.

Bî silavêñ şoreşgeri û birati Rizgarixwazêñ Neteweyêñ Kurdistanê

KUK  
Liqê Swêd

Jî diwana Federasyona Komelêñ Kurdistan ra, kongra 5emin.

Weki ku hun ji dizanin girin-giya vi roja han wisa vekiriye ku lî ser nayê minaqeşekirin.

Dîvê roja giringda daxwaziya me ewe ku ev kongra han bibe gaveki pêş ji bo helkirina problema û serfiraziye.

26-1-1985

bî silavêñ germ  
Komita Piştgirtiya gelêñ Kurd  
û Türk li Uppsala

Hevalêñ hêja,

Vexwendnama jî bo Komci-

vina we iro ghişte me. Em pê gelek kêfxweş bûn û spasi we dikim.

Mixabin beşdarbûna me ya Komcivinê ne mimkine lê em bî dil bî we re ne. Hêvidar in ku dê ev Komcivin di riya pêşvebirin û kûrandina jiyana demokratik a Federasyonê de gaveki bêrepêş i giring be, peywendi û têkiliyên nav Kurdêñ welatparêz ên swêdê xurtur û aheng-dartir bike û jî vê Komcivinê Federasyoneke hê bihêzter derkeve jî bo çêtir xizmeta gele kurd ê bindest.

Dî xebatêñ we de serketin û serfiraziyeñ mezîn daxwaz dîkin, silavêñ dilgerm ên hemû hevkareñ Enstituya Kurdi pêşkêş dîkin.

Enstituya Kurdi

Zor sıpas jî bo banga we. Mixabin ez nikarım û imkanêñ min tunene weki ez dî kongra we da cih bigrim, lê disa ji, ez dixwazim jî we ra silavêñ xwe bîşinim û ez jî we ra kongreke serfiraz hêvi dikim.

ANITA GRADIN  
Wezirê Mihaciran

Me gelek dixwest, dî kongra we da em besar bibin, lê mi-xabin dî wê demê dacivina me ya rîvabîrinê hebû. Jî ber vê yekê, em jî we ra hêvi dikin silavêن serketinê û hêviyêن kêrhati û baş jî bo kongra we û jî bo hevkariye.

Bî navê Federasyona Yugoslav serok

Miodrag Smiljanic

Jî seroktiya diwana kongra Federasyona Komelêن Kurdistan li Swêd ra,

Dostêن giranbiha,

Komcivina we (kongre) dî demeke ku, dinya û welatê me dî nava kritikê deye, kom bû.

Tede û sawa ku cunta faşist li ser gelê me dajo, bî êriş û operasyonênen jenosid(qırkırm) ku, dî vê dema dawin de li bakur û başûri Kurdistanê hate kîrin, giha bergehekê nû.

Jî çi sedemê dibe bila bibe, ev tadêن ku li Kurdistanê têن bîkaranîn, zor û operasyonênen jenosid jî stratejiya emperyalismê ya ku, dixwaze li rohilata navin kelehêن xwe yêن keti bicebirine û bîhêztr bike, nayê qut kîrin.

Em İSTİB dixwazin carek din diyar bikin ku, em li gel gelê Kurd in ku, hatuye belengaz kîrin, perçqandin û wendakirina wi tê xwestin.

Divê general destêن xwe jî ser gelê Kurd bîkşinin. Piştgiriya bî gelê Kurd ra iro bûye nişana demokratbûn û aşiti-xwaziyê. Yêن ku şerê gelê Kurd ku, jî xeyni xwestin û pêşkêşkirina mafê çarenûsi pêve tişteki din naxwazin, bî sedama mijâ provakasyonan nebinin, û jî vê sedemê yêن ku li hemberi kampanyayê şermizari üşovenist ku jî bo netawa Türk şermizari ye, seyîdar bininin li gor me, dî metirsêن (tehlûke) ku Tirkîyê li hembere hê tê ne gîhiştine.

Metîrs mezîn û cangire. İro, ser ketîna gelê Kurd û Türk li hember cunta faşist, gîrêdayî

yeKITIYA hêzêن herdû gelane.

Em piştgirtiya gavên ku, jî bo yekiti, piştgiri û hevkariya herdû gelan bên avêtin, dikin.

Em Bawerîn, danûstandinênen dostani ku, dî navbera me da hene wê hê xurttir bîbe.

Em komcivina we jî dil piroz dikin, serketina we dixwazin.

Biji tekoşina gelêن Kurd û Türk!

İSTİB

Yekitiya Pê şverûyêن Türk

li Swêd

Jî Oswald Sodeqvist ra,

Em, bî vê nama xwe, jî te û hevalêن te yêن partiyê hêvi dikin, ku wun buyera mudaxelekirina Tirkîyê li ser zarokxana kurdi li Tensta bibin meclisa Swêd.

Lî gor dan û standina me bî kurdêن Swêd ra ew jî li ser vê buyerê gelek binteng bûne û bê alikar mane. Baweriya wan eve, ku Swêd dikaribû bî xurti li dîj vê mudaxela Tirkîyê derketa.

Bî silavêن germin

Jî Ove Radberg ra

Em gelek spas dikin, ku tu li dîj mudaxelekirina konsolosiya Tirkîyê jî zarokêن kurd ra xwe di derketi.

Em, Federasyona kurd, jî bo xebata te yê ser zarokxana kurd li Tensta, carek din ji spasêن xwe diyar dikin û piştgiriya te dikin.

Bî silavêن dosti Federasyona Komelêن Kurdistan li Swêd

Jî hukumatê ra,

Em navbera 5-6 hezar kurd, ku li Swêd rûdinêن, xwe û zarokxana kurdi li Tensta, dîbin tehdida balyozxana Tirkîyê da dibinîn.

Em hêvi dikin, ku vê buyera han li meclisa Swêd bê te munâqesekirin.

rokxana kurdi li Tensta û mudaxelekirina balyozxana Tirkîyê dî hukumeta wê da bê minekeşekirin.

Bî silavêن germin Federasyona Komelêن Kurdistan li Swêd

Jî Meclisa Swêdra,

Em navbera 5-6 hezar kurd, ku li Swêd rûdinêن, xwe û zarokxana kurdi li Tensta, dî bin tehdida konsolosiya Tirkîyê da dibinîn.

Em hêvi dikin, ku vê buyera han li meclisa Swêd bê te munâqesekirin.

Bî silavêن germin Federasyona Komelêن Kurdistan Li Swêd

Jî bo kongra 5. ya Federasyona Komelêن Kurdistan li Swêd

YNK silavêن xwe yên germ û pirozbahiyêن xwe pêşkesê kongra Federasyonê dîke. YNK hêvi dîke ku kongre jî bo bîchihanina armancêن gelê me û mafêñ wi yên demokratik, neteweysi û mirovahi dî warê rînişandan û ronikirina planêن xebatê de bî ser keve.

Her weha em hêvidar in ku Federasyonî ruhiyeteki fedekarî û bî zaninekê berpirsiyari yên erkêن niştîmani û bî dîlsozi û hisyari jî bo yekkîrm, birêxistin, xastîna nav xebat û xurtkîrîna hemû hêzên Federasyonê rê û rîgeh dayine pêş xwe.

Ü jî ber vê yekê jî parastîna yekitiya hêzên Federasyonê û peştexistîna wan gelek giring e. Jî lewre, hingê bîryarên kongra we bî cih têن û ev yeka jî bo gelê me, şoreşa wi û xebatên wi yên rizgarixwaz dî hemû parçen welatê me yê wergirti û dabskiri de, dî warê rizgari û paşerojeke çêtir de dibe hizmetekê hêja.

Yekitiyê Niştîmani Kurdistan Rêxistîna Swêd  
26.01.1985



# BIRANINA KOMARA MAHABAD

A.BAWAR

39 sal berê, 21'ê Çileyê Paşin sala 1946 an da bî pêşengiya PDK-Îran li Kurdistanâ Iran da Komara Mahabadê hate damezrandin. Her çiqas emrê Komara Mahabadê kurt bû ji, damezrandina Komarê dî jina gelê kurd da, dî diroka Kurdistan da cihek û rolek gelek giring digre.

Wek tê zanin, dî despêka şerê cihanê ya duwem da leşkerê Yekitiya Sovyet ji ali bakur va, leşkerê Ingilizan ji ji ali başur va ketbû Iranê. Yekitiya Sovyet ji bo, ku sinorên xwe yên Qefqasya biparêze û qewi bike ketbû Iranê. Dema ku leşgerên Sovyet Kete Iranê, leşgerên Iranê ji Kurdistanê kişiyan û çek-silahên xwe li vir hîstîn. Gelê kurd vi fersendê baş bikar ani û çek-silahan bî dest xîstin. Dî sala 1942 an da bî navê Komel rîxistînek hate damezrandin û ev rîxistin dî demeki kurt da bingeh girt, gelek xurt bû

Dî demeki kurt da ji ali rîxistini, hunermendi, çandi, weşanan û hwd. pêşveçûnek mezîn pêk hat. Bî navê DAYKA NIŞTIMAN tiyatroyek, bî navê KURDISTAN rojnameyek, bî navê HİLALE kovarek jinan, bî navê HAWAR Ü A-gir ji, weşanên hêja hatin weşandin. Bir û baweriya welatparêzi gihişte merheleyek bîlind. Ji her çar perçen Kurdistanê nûner dihatin vê derê, vi roja hanê piroz dikirin û şâ dibûn.

Dema, ku rîxistina KOMEL hatibû damezrandin, Qadi Mihemed ji bûbû endamê vê rîxistînê. Dî sala 1945 an da heyetek çû Yekitiya Sovyet û bî serokwezirê Azerbeycan, Cafer Bakirov ra axifi. Ev hevditîn ji bo xudmixtariya Kurdistanê bû. Danûstandına nava kurdan û Sovyet roj bî roj xurt bû û bî navê KOMELA ÇANDA KURDIS-

TAN Ü SOVYET komelek hate damezrandin. Dî sala 1945 an, meha Cotmehê da lî ser himê KO-MEL' ê PARTI DEMOQRAT A KURDISTAN hate damezrandin.

Sala 1946 an meha Çileyê Paşin da, lî meydana ÇUWARÇIRA da Qadi Mihemed damezrandina Komara Mahabadê elan kir. Qadi Mihemed bû serokê Komarê. Piştî damezrandina Komarê, navbeyna Komara Azerbeycanê û Mahabadê pêwendî xurt bû û dî dî navbeyna herdû komaran da peymanek hate êlankirin. Lê, avakırina herdû komaran, imperializmê pir ne rehet dikir. Ji ali imperializma Emeriki û Ingilizi gelelek dek û dolav hatin gerandin. Sala 1946 meha Gulanê da Sovyet leşgerên xwe ji vê derê kişand. Wê demê bî alikariya Emerika û Ingilizan, leşgerên Iranê êris anin ser Azerbeycan û Kurdistanê. Lî hember vê êrisê bîryara gelê kurd, parastina welatê wi bû. Dema, ku Azerbeycan kete bin destê Iran, rewşa kurdan ji ne baş bû û hin serok-eşir çûn gihiştin İraniyan. Şoreş têk çû. Mahabad teslim bû. Qadi Mihemed, serokwekil Heci Baba û baqanê şer Seyfi Qadi hatin dardakirin.

Jî wê rojê heta iro gelek sal derbas bûn û gelek tişt guhurin. Gelê kurd bî agirê wê rojê tim şewiti, ew agir tucar ne temiri. İro ji, li çiyayê Kurdistanâ Iranê, ala azadiyê dî destê pêşmergên qehreman da bûye tîrsa xewnê dijmîn. Bila dijmîn baş bizanibe, ku gelê kurd tucar seri pêl nake û heta welatê xwe rizgar neke, nasekîne!

# K U R D

KURDOX

Pirtûkek nûh bî navê 'KURD' bî zimanê ûrîsi lî paytexta Sovyetistanê lî Moskova sala 1984 an da hat weşandin.

A.M.Mêntêşavîli niviskarê va pirtûka giranbuha ye, niviskarê gernas berê ji pir pirtûkên hêja bî zimanê dayika xwe gurci, li ser gelê me dane çapkîrin, wek "Pirsên Pêwendiyê Zevi Çandinê dî Kurdistana Hevdemda" Tîblîs 1976. "Pirsên Diroka Kurdan lî Rojhilata Navin da" (sedsalêن x-x) Tîblîs 1978. "Jî Diroka Tevgera Rîzgarixwazê Kurdan lî Iraqê" (1919-1925), Tîblîs 1965. "Kurd û Kurdistan" (pirsên pêşda çûna civaki û abori), Tîblîs 1977 û yên mayin.

Berpîrsiyarê rîdektâ pirtûka "KURD" hozanê mezîn dirokzanê bî nav û deng, xudanê pir pirtûkan li ser gelê me, M.S. Lazerev'e.

Pirtûka nû bî 238 rûpelan e û bî sê besêng bingehêن hatiye parvekirin. A.M.Mêntêşavîli dî pêşgotinê da dînivise, axa Kurdistanê dî nav çar hukûmetên rojhilata Navin û Nêzik da (Tîrkiyê, Iran, Iraq û Suriyê da) hatiye dabeşkirin. Kurdistan 408 hezar km<sup>2</sup> ye. Kurdistan ciheki erdnigari zor gîringe, herdem bala biyaniyan bî sar xwe da kışandiye. Kurdan bê rawestan û bî mîrani piştgiriya xwe li diji êrişen Ereban, Tîrkan û Fârisan kiriye.

Dî despêka heyama derebeyî da imaretên kurdi (Mîristanê Kurdan) bandora rîzaniya gewre li rohilata navin kiriye, rolek mezîn dî eninivisiya gelên navçê da listiye. Jî despêka sedsalêن şanzdan Kurdistan bû meydana şerekî bê rawestan, jî bo zepkîrina wê du karbîdetên müsluman, Iran Sefavi û İmparatoriya Osmani li diji hevşer dikirin, dî piştra li gor peymana "Zahîb" dî sala 1639' an da Kurdistan dî nav xwe da parvekirin, ev dabeşkirin heta niha rola ramyari dî eninivisa gelê kurd da dilize. Pişti şerê Cihânî ya Yekan, Kurdistan dî nav çar welatan da hat parvekirin (Tîrkiyê, Iran, Iraq û Suriyê). Kultur, abora civaki û rewşa rîzaniya dervayî li her çar perçen Kurdistanê ne wek hevin, lê, tevi va cûre-cûre bûnê çar beşen Kurdistan dî aliyê pêşdaçûna abori da pir wek hevin.

Dirokzanê pîspor dî va xebata xwe da, bî taybeti li ser pîrsên jêr sekîniye û bî nêrinê berbiçav lêkolin û légerinê zanisti li van pîrsan kîrine.

A — Abori, Jin, Rewşen û Şarîstan:

1— Perwerdekîrîna pêz (pêz xwedikîrîn).

2- Zevi çandin.

3 Bingeha şêweyêن zevi çandinê.

4-- Rewşa rîncberêن zevi

çandinê.

5— Bajar û jina bajêr, rewşa pêşkariyê û bazırganiyê lî Kurdistanâ Tîrkiyê, Iranê û Suriyê.

6— Jin (kulfet, pêwendiyâ mirovi (xizmi), moral (exlaq) adet û ol.

7— Rewşen û Şarîstan. (Ziman û Nîvisandîn, wêje, weşanênen pêryodi (dem-demi).

B — Elêñ Kurdan û Hevgirtina Elan:

1— Rewşa abora civaka elan.  
2— Pêwendiyâ abori dî nav êlan da.

3— Sistema yekitiya rîzaniya êl û hevgirtina elêñ kurdi. (êl û yekitiya elan lî Iraqê, êl û yekitiya elan lî Iranê, êl û yekitiya elan lî Tîrkiyê).

4-- Bingeha rîzaniya hukmê serokan, êl û imaret (miristan) serdarêñ navbendi.

C — Pêwendiyâ Zevi Çandinê û Pêşdaçûna Abori:

1— Pêşdaçûna pêwendiyê zeviçandinê dî heyamên dirokê da (dî sedsalêñ navin da û dî dema niha da).

2— Zeviçandin dî dema niha da lî Kurdistanâ Tîrkiyê, Kurdistanâ Iranê, Kurdistanâ Iraqê, Kurdistanâ Suriyê.

3— Bîkarînîna zeviyê dî Kurdistanê da, dî dema niha da.

4— Kirêkari (xebata bî kîrê lî cem derebegän û dewlemen-dan), formen parvekirîna berhemên zeviçandinê, kirêkari bî peran, kirêkari dî aboriya pêz-xwedikîrîne da, formen nû dî kirêkariya zeviçandinê da.

5 - Pêşketîna awayêñ zeviçandinê û pêşdaçûna hêzên berhemkar dî dema niha da lî Kurdistanê. (awayêñ zaviçandinê lî Kurdistanâ Iraqê). (qanûnêñ zeviçandinê û guhartînê wan lî cem Kurdêñ Suriyê). (reformkîrîn û serastkîrîna zeviçandinê dî salêñ 60 lî Iranê û encamêñ wê yên bingehin),

(Dûmahîk Rûpel 18'a da)



# **Nameyek ji bo Seydaye mezin**

# **CİGERXWİN**

*Seydayê Keleş*

Bist û duduwe dehan nexwes hat  
Heştê û çaran duşema reş hat  
Daxen te li dil bi ar û şewat  
Heyfe ko te rih daye Cegerxwin

Seyda te ceger li me kırın sot  
Rêça xebatê bo me gelek got  
Şûva me beyar te lê díkîr cot  
Ka ew tev liku maye Cegerxwin

Bo çı te niha jı nav me da rê  
Reş bûn li me tev gulên buharê  
Em tevde dikin qir û hewarê  
Derdê te li me daye Cegerxwin.

Desteme çîma niha te berda  
Zûbû te rihê şerîn bi derda  
Ziyanek mezin giha me kurda  
Çûna te zîrar daye Cegerxwin

Heft salan tu dûrket çû Swêdê  
Xema te dixun gelek vê de  
Zani ko me dil agirek têde  
Ev kul tev li dil maye Cegerxwin.

Sed heyf û mexabin me digotin  
Ev dil û kezeb me tim disotin  
Pir tiştên te mabûn te negotin  
Ked kul bi te re maye Cegerxwin.

Bist salê din me digo tê bimini  
Rist û diwanan ji mer bisini  
Millet le venêri wê bixwini  
Soza te ji merdaye Cegerxwin.

Gazin me dikir ji vê jiyânê  
Tîrsa me nebû ji vê ziyanê  
Hawar û gazi ji vê nemanê  
Ka wek te liku maye Cegerxwin.

Bin destande maye ev gelê me  
Barê pir giran te da milê me  
Agir te rijand li nav dilê me  
Keyo ev xeber daye Cegerxwin.

Derdê te iroj lı me xuya kır  
 kani û çemên me te ziwa kır  
 Rengê xwe jı ber me te wunda kır  
 Berê me nivco maye Cegerxwin.

Sed gavên me yek piyên te nine  
 Dengê te heta heta dîmine  
 Navê te dici ta Hind û Çine  
 Rêça te jı mer maye Cegerxwin.

Tu pir gerekbû dî vê demê de  
 Dilê me te kuşt dî vê xemê de  
 pelê me zerbûn dî vê lemê de  
 Gazin me jı kê maye Cegerxwin.

Te pişt û milênen me tev şikandin  
 Bi sed û dehan te em xapandin  
 İroj em lı hev te dan gerandin  
 Min dil bı te re maye Cegerxwin.

Dil sozênen me tev lı ser te digrin  
 Mêr û jinênen me hemi dikin şin  
 Em tevde lı ser te bûn ceger xwin  
 Navê te jı mer maye Cegerxwi

Rewşen bı te bû, tu bû çira me  
 Kara me tu bû, tu bû gera me  
 Baskê me tu bû, tu bû fira me  
 Rênasê me kurdaye Cegerxwin.

derdê te lı ser me pir girane  
 Me dil û hinav hemi bı jane  
 Gazin jı me nek em bê rewane  
 Zana û tu hêjaye Cegerxwin.

Rengê te lı ber çavê me saxe  
 Ristêne te lı nav destê me baxe  
 Rihni û lı ber me tim çiraxe  
 Zanin ko tu seydaye Cegerxwin.

Kara me dı karê te de pîrbû  
 Para me dı xema te de dîrbû  
 Agr te dîdada timi gurbû  
 Te nav dı millet daye Cegerxwin.

Şûna te lı nav me pir xuyaye  
 Navê te lı nav me pir buhaye  
 Rûni û te rewşen pir dîdaye  
 Nişana xebat maye Cegerxwin.

Banga te giha Awrûpa tevde  
 Dîr û cewherbû zîman dî dev de  
 Wek hiva lı çardehan dî şev de  
 Mala te xweş avaye Cegerxwin.

Şopa te lı dirokê xuyaye  
 Dengê te lı cihanê belâye  
 Yek wek te dî nav me de nemaye  
 Navdar û ne wundaye Cegerxwin.

Peyaki gelek jir û çelengbû  
 Rengê te weki şer û pilingbû  
 Mêrxas û gelek bı nav û dengbû  
 Dengê te jı mer maye Cegerxwin.

Dengê dici ta binê deryan  
 Bo eşâ mullet te daye derman  
 Bo kurdê me tu hekimê luqman  
 Dara te ye pel daye Cegerxwin.

Xêzênen te lı nav millet bı carek  
 Şin kir te lı nav kurda buharek  
 Nehîş te lı Kurdistan beyarek  
 Tovê te ye zîl daye Cegerxwin.

Fortênen te ketin guhê neyaran  
 Zengîl te birin serê zîmara  
 Qirin te dîdan lı her kenaran  
 Dijmin ketiye tayê Cegerxwin.

Sed rehmet lı gora te bîbari  
 Kurê Hesenê Sofi Hesari  
 Karê te dîkir hemi şiyari  
 Keleş hê bı ter maye Cegerxwin.

Gel tev de lı ser te civiyaye  
 Gora te dî nav gulan de maye  
 Mizgin me lı te guneh ne maye  
 Deng bo te millet daye Cegerxwin.

# Mamosta ELADİN SUCADI

## Çû ser heqîya xwe

Aso Garmiani  
Stockholm.



### Kurteyeki jiyani Mamosta ELADİN SUCADI

Mamosta Eladin le sali 1915 le dayka xwe bû. Le faqeyeti u layeti xwenduyeti u le hereti la-weti da hatete meydani jiyani roşinbiri u rojname nusûwe u leki balay biniwe le govari Gelawêj da ke de sali xayand, her weha nuseri govari nizar biwe ka govareki ramyari u roşinbiri biwe u 22 jimaray le derçwe.

Mamosta Eladin endami karay kori zanyari kurd biwe u tar u lêkolineway le jimarekani gavarri kori zanyari kurda bîlaw kirdotewe.

Mamosta Sucadi le êvarey 13/12/1984 da koçi dîway we.

### Berhemekani

Mamosta Sucadi ziyatir le bist kitêbi benirxi heme cori dana-we weku:

- 1- Mêjûy edebi kurdi.
- 2- Nawiy kurdi.
- 3- Geştek le Kurdistan da.
- 4- Destûr u ferhengi kurdi.
- 5- Hemîşe benar.
- 6- Edebi kurdi niwê u lêkolineweke edebi kurdi.
- 7- Nîrx şinasî.
- 8- Kurdewari.
- 9- Degekanî edebi kurdi.
- 10- Kurd u şorîşekani kurd u komari Iraq.

Eger birwanine kelturi u kelew-puri milli u folkloriman debinin xaweni serçaweyeki zor dewle-medin le niştimanek da ke

çendeha zana u edibi benaw-bangi weku Xani u Mewlewi u Goran u.....heta.

Niştimanek herdem goristani dujminan u gorepani coreha zolm u zordari u dayki hezareha şehid u çenimuney qaremaneti u xoragirtin beramber koştin u daplosin.

Niştimanek ke melbendi raperin u şorîş u xaweni deyeha dastan u çiroki palewaneti u şorîşgeri-ye. Lew rojewe ke kurd seri dawe le Kurdistan da, aşkîraye uşey reseni kurdî u zîmani zig-mak be xem u xwêñ u jan Her le mêtjewe çendeha zana u şair u têkoşer u edib le naw cer-gey kurdistan da le Soran u Mu-kîryan, le Cezire u Botan hel-kewtûn u gewre bûn u debin.

Lewane...şorîşwarêki resen, rojnamenuseki pesen, nusereki swarçak, edibeki zor despak, kurdperwereki zana, mêtju nuseki dana, benawbangeki le hatu, mezineki nemirdu....., Zanay kurdi koç kirdûyi nemir Mamosta Eladin Sucadi, ke xaweni berhemeki zori kurdi ye,

weku samaneki gewre u yeki zor dewlemend le iyani bi u roşinbiri da.

Mamostay xwa lê xoşbu şaswari be twanaw pispori meydani (mêtjûy edebi kurdi) u nîrx şinasî u edebi kurdi nwê u....het-yen weku rojnamenusu ziman-zan le govari Galawêj u nîzar da kari kirdûwe. Her weha weku mêtjunuseki netewey u helsen-gandini şorîşekani kurd u Mamosta Sucadi le naxî dilewe xizmeteki zori edebi u zîmani kurdî kirdîwe u zor dilsoz u kurdperwer bûwe, eger çi çerxi gardîn zana u nusereki way le sendin! Eger çi koçkîrdîni Ma-mosta Sucadi zîyanekî gewre belam mamosta her nemire u le naw me da her diyare u le bir u hesti me da emêne.

Mamosta Sucadi çendeha roley kurdî pe geyand u birwa namey bekaloriosi edeb u zîmani kurdî pêşkêş kirdin u esta ewaniş le xizmeti edeb u zîmani kurdî da tedekoşin.

Her çende bo mamosta Eladin binusre her keme, çunka ma-mosta qerzeki zori le ser mane! Ca boye debê xamey xwendka-ran le gîrbê le pênavi ni wişey kurdi u hiwadarîn ê-meyş bitwanin lew xizmeteda tk bigeyenin.

# NEWROZ

## BI ŞAHİYEKİ MEZİN HATE PİROZKIRİN

Nîha li Kurdistanê zivistana sar û xedar hukmê xwe wunda kûriye. Berfa çiyayan berxwe nade êdi. Cûre-cûre kulilk û çiçek jî serma û berfê ra meydan dixweynin û mizgina bîharê li hemû çiyayan belav dîkin. Dâristan, mîrg û zevi xemîlandiye seranser. Hemû mexlûqên tebyetê sîtrana bîharê, sîtrana roj û jiyana nû dîstrîn bî hevra. Tebyet jî xewa zivistanê şiyar bûye û jî nû va tovê jiyânê li

her ali direşine. Berf, serma, seqem û hemû bîlayê zivistana bextreş hukim nake û nikare berge lîpêsiyajîyanê bigire. Tovê jiyânê jî her car bêtir zil dîde û li xwe dixe. Evya berxwedane û bî serketina jiyânê ye li hember tofan û belayan!

Newroz dî jiyana gelê kurd da cîheki gelek gîranbuha digre. Newroz mizgina serfiraziyê, serketinê, germ û roniyê û berxwe-

danê ye. Jin ges dibe, rê û dîrb vedibin, gundi dadikevin bajaran. Dema dilanê ye, dema go-vendê ye, dema hevitina evindarara ye. Keç û bûk li ser kaniyan digihêñ hev û bî kîf û he-nekin. Jin digihêñ hev li bin di-waran, li ber tendûran û laqirdiyan dîkin. Dayikêñ Kurdistanê disa keç û lawêñ nû tinin. Ü gelê kurd jî jineki nû ra, jî berxwedanek nû ra xwe amade dîke. Van gotinêñ me aliyeki jinê, aliyê baş û xweşik dîde xuya-kîrin.

Lê aliyekê dîn ji heye, ku jinê diherimine, ti tam û xweşî nahêle. Ew ali, ku zarokan li ber diwaran stuxwar û sêwi; jin û bûkêñ cuwan bi; keçikêñ der-gisti dî malêñ bavan da çav li rê û dil şikesti; dê û bavan dî his tirê çavan û dî derd û xeman da bê hêvi dihêle. Malan wêran, mirovan koçemal dîke. Kilit li devan dixe, mîjiyan zengar dîke û jinê jî gel ra qedexe dîke. Bîrçibûn, xîzani, belengazi û hê siri, dizi, xerabi hoviti, teresi, û berederi peyda dîke. Dewle-menda dewlementir, birçiyen birçitir dîke. Ew e û navê wi faşizme, zordariye, kedxwariye, barbariye, Lî pêş ronahiyê ewr û reşayı ye.

Bî hezaran karkir, gundi, xwendevan, ronakbir dî girtigehandane. Gelek jî wan hatin





21 3 85

kuştın, birindarkırın, seqetkırın Hemû cûreyên êşkencan têne cerîbandin. Welatê me yê xweş û fireh dî bin lingan da tar û mar, bûye meydana hespê neyar. Axa me yê ziv û zêr, keda me tê kişandin. Welatê me dî nav gurên dev bî xwin da hatiye parvekîrin. Dixwin, vedixwin, kaş dikin, talan dikin.

Lê ser vi erdê hanê ticar bê hêvibûn cih negirtiye. Gelê kurd wek pîlingen ser piyane. Lê mixabin, Newrozek din ji dî bin mirê bindestiyê û koletiyê da derbas bû. Dijmin hê ji a dilê xwe lî hember gelê me pêktine. Lê kurd, ne kurdê berêne. Ew, niha bî hêztrî û zanatîrin. Dek û dolavê dijmin êdi baştê naskîrin. Dijmin ji viya baş dizane û dîturse. Û em bî vê Newrozê gavek din ji nêzi azadiyê bûn.

Wek her sal isal ji, Federasyona Komelêñ Kurdistan Li Swêd li bajarê Stockholmê bi şevek xurt Newrozê piroz kîr. Dî şevê da seriya hezari besdar hebûn. Şeva Newrozê bi axaf-tina serokê federasyon vebû. Serokê Federasyonê dî axaftina xwe da bî kurti dirok û giringiya cejna Newrozê da xuyakîrin. Peyra, rewşa her çar beşen Kurdistanê eşkere kîr û teda û zordariya, ku ser gelê kurd tê demandin rûreş kîr. Dî dawiya a

xaftina xwe da bal kişand ser rewşa gelê me, banga yekiti û hevkariyê û bî hêz kırma federasyonê kîr. Dî şevê da belavok hate belavkîrin. Komêñ govendgêra çend numûneyên folklora kurdi nişan dan. Komêñ muzikan û sazbend ji muzika kurdi hunerên xwe amadekîrin. Dengbêj sitranêñ gelêri û folklori pêşkêş kîrin. Helbest hatin xwendin û folklora zarokan reng da şevê. Bî kurtayî şev, dî kîf û şahiyê da derbas bû. Ji xêni vana, ji bo pirozi ya şevê gelek silavname ji rêxistin, komel û şexsan hatin: Partiya Pê-

şeng a Karkirê Kurdistan-Komita Swêd (PPKK), Rizgarixwazêñ Neteweyêñ Kurdistanê (K.U.K), Komita Yekitiya Muwaqat A PKK'ê, Koç-Kak, Komela Hevkari û Kulturi a Kurd TOB-DER Komita Swêd, Komita Piştgirtina Rêya Şoreş Li Swêd, û hinek mirovêñ pêşverû û welatparêz.

Federasyona Komelêñ Kurdistan Li Swêd cejna Newrozê ya gelê kurd piroz dîke, ji gelê me ra serketin û serfirazi dixwaze

—Biji Newroz!

—Biji Hevkari.



21 3 85

A. BAWER

16/17 Sıbatê 1985'an da lı Bajarê Stockholmê Komcivinek pêkhat. Komcivin bı navê "Dî Tirkîyê Da Demoqrasi û Heqê Mirovati" hate amadekirin. Bi rasti di demeki weha tari û teng di pêkanina komcivinê gavki pêşketi û bûyerek hêjabû. Komcivina Stockholmê ji askerekirina rûreşıya cûnta faşist, ji bo danasina demqrasi û heqên mirovati yên Tirkîyê fersendek bû. Dî vi wari da gelek berpîşyariyê giring diket ser milê mirovên pêşverû, demoqrat, aşitixwaz û rizgarixwaz! Çawa, ku me bı hêviyeki baş lı komcivina Stockholmê mêze díkîr, wusa ji, me hêviya bîyarên baş û objektif díkîr. Jî ber vê yekê ji, em bı komcivinek weha kêfxweş dibûn û pişgiriya wê xebate díkîr. Lê mixabin ew hêwiya, ku me jî komcivinê û nûneran díkîr, ne hate pêkanin û komcivin bı kêmani û şasitiyek mezîn derbas bû.

Jî munaqêsekirina demoqrasi ya Tirkîyê û heqên mirovatiyê ra gotnek me tune. Lê mirovên, ku Tirkîyê jî nêz yan ji dûr va nas díkîn, hemû ji, dizanın di Tirkîyê da ne tenê tirk hene, wusa ji, 12 milyon kurd û çend gelên bîçûk ji hene. Jî dema Osmaniya heta iro gelê kurd û welatê wi Kurdistan di bin ni'rê kolonyalizmê da; di bin zulm û tedayêk nedîti da; di bin asimilasyon û qedexeyan da jineki dijwar dajo. Cunta faşist li hember gelê kurd şereki ne êlankırı didomine. Bajar û gunđen Kurdistanê têne bombekirin, bı qefle-qefle têne girtin, êşkencelerin û kuştin. Eriş ne tenê lı Kurdistanâ Tirkîyê wusan ji, lı hember Kurdistanâ Iraq û Iranê te kırın. Cunta faşist di rojhîlata navin da büye ussêن êrişkariyê. Ew bı her

hawê planêن Emerika Yêkbûyi ê pêk tine û dî Kurdistanê da çek-silahêن atomik bı cih dîke. Niha ji, bı hezaran pêşverû, demoqrat, welatparêz û mirovên bêri dî zindanan da têne nałandin. Dî gelek girtigehêن Kurdistanê da bı dehan kes dî êşkencan da hatin kuştin, bı sedan kes hatin seqetkîrin û disa bı dehan kes bı fermi hatin dar-dakîrin. Van zordestiyan bo çi têne kîrîn? Jî ber ku ew daxwaziya heqên demoqrati û neteweysi díkîn, ji ber, ku ew dixwazîn wek mirovan bijin û hevçaxê gelên dinê bin.

Jî barê va hebûna gelê kurd hatiyê inkarkîrin û evya dî Tirkîyê da siyaseteki fermiye, ni-jatperesti û şoveni ye. Siyaseta dewleta Tirkan di nav demoqrat û ronakbirêñ wi da ji şax daye û wextê behsa kurdan dibe ji, ew wek cin jî vê meselê direvin û rîcîfîn! Iro ji, ew mirovên ku dî Tirkîyê da ji xwe ra dîbêñ demoqrat, pêşverû û ronakbir ji veni û dûvíka burjuvaziyê ketîne û wextê behsa kurdan têne kîrin siyaseta fermi dixebeitinim. Jî ber vê yekê, tu daxwaze-ki me jî wan kesan tune û rewşa wan ya çinayeti jî me va aşkera ye. Lê daxwaziyê me jî rîxistin û mirovên, ku zagonê şo-reşvanî dixebeitinim û xwe xwe-di bir û baweriki dibinin heye. Dî komcivina Stockholmê da ji, daxwaziya me her jî mirovên wehabû.

- Ger dî Tirkîyê da heqên mirovati ketibe bin lingan, zêti-rinê wi dî Kurdistanê da ye.
- Ger behsa birçibûn û belengazi bête kîrin, zidetirinê wi dî Kurdistanê da ye
- Ger êriş, zulm, zindan û kuştin bête qisekirin barbariya mezîn dî Kurdistanê da ye.

# Çend Gotin Li Ser Konferans Stockholme

— Ger behsa demoqrasiyê bête kırın, ev çend sed sale ku di Kurdistanê da heqên demokratik ji bo gelê kurd hatiye zincirkirin û qedexekirin.

— Ger tekoşinek diji cûnta faşist hebe, kurd ji kesi ne kêmtrîn û berxwedanek mîrxasi dî dominin. Lî welat, li girtigehan û welatên Ewrûpayê da ji, ji herkesi bêtir kurd di tekoşinê da ne û dî her fersendê da li dî ji cûnta faşist dengê xwe bîlind dîkin.

Pışti, ku rewş û rasti wehaye, çawa di komcivinek, ku li ser Tîrkiyê munaqeşe bete vekîrin û milletek 12 milyon nê ditin..!


Wextê ku li ser denoqrasiya Tîrkiyê û heqên mîrovatiyê munaqeşe bê te vekîrin, bî tu hawî mîrov nikare gelê kurd ji

meselê cûda bîke. Dî Tîrkiyê da hebûna demoqrasiyê girêdayî çarelê kırına mafê gelê kurdan e û wextê komcivinek weha da ji, mesela gelê kurd nê şirovekîn evya koriti û şâşitiyeki mezine. Ew mîrov û rîxistinê ku di vi munaqeşe da li ser navê pêşverûtiyê, demoqratiyê û şoreşvaniyê milletek 12 milyoni nebîne û li pişt guhê xwexe, mîrov dîkare bêjê ku ew ji aşê burjuvaziyê ra av dikşine. Lê mixabîn, di komcivina Stockholmê bî zanebûn mesela gelê kurd ne hate munaqeşêkîn û disa bî zanebûn ji bo ku nekeve munaqeşê gelek xweydan hate rêtin.

Dî komcivinê da avukatek kurd Yûcel Yeşilgoz rengek da

vê munaqeşê, mesela kurdan a-nî ber çav û rexne li kêmeňia komcivinê girt. Dûra ji, pêşneyarek li ser mesela gelê kurd pêşkêş kîr. Dî komcivinê da ji xêni du kesan, kes alikariya vê pêşneyarê nekir. Lê pêşneyara Yûcel Yeşilgoz gelek bala nûneran û mîvanan kişand û bin li komita komcivinê teng kîr. Ger pêşneyar bî tevayi nate qebûl kîrim ji, qismek jê; "li diji zulm û zordariya ser ziman û çand û surgûnkîrina gelê kurd bê te sekinandin." di belavoka dawiya komcivinê da hate bî cih kîrin.

Lê mixabîn, li ser komcivinê bî her awayi tesira sosyal demoqrafa aşkera bû û daxwaziya wan pêk hat.



# PIRSÊN ZAROKÊN

## K U R D

- ROHAT -

Dî 11/12/13'e meha duwamin da lî bajarê Stockholmê civinek pir mezin lî ser rewşa zarokan hat pêkanin. Ev civina bî navê "Rojên Zarokan" hate bî navkirin û jî aliyê rêxistina "Rizgarkırına Zarokan" ev roja hatin amadekirin. Ev rêxistina, rêxistfineke gelek mezîne dî warê çarelêkirina pirsên zarokan da, nêzkaya 70 hezar endamê wê hene.

dî vê civina sê rojin da nêzkaya 1000 kesi beştar bûn, lî ser pirsên zarokê Swêdê û zarokên cihanê gelek kesan raporêن xwe xwendin û baweriyêن xwe pêşkêş mîvanan kîrin. Dî roja duwemin da, ev civina bî taybeti lî ser zarokên biyaniyan û rewşa wan hat firehkîrin. Ev roja bî navê "Rastiyêen Psikologiyê Dî Nav Zarokên Biyani da" hat navkirin. Zarokên ku welatê xwe hiştine hatine welateki dîn, pirsên wan çîne êş, janêن wan çîne, problemên zîman, çand û şaxsiyetê çawa xwe xuya dîkin, ew zarokên ku dî nav şîr, dengê top-tivingan û dî nav belengaziyê da mezînbûne mirov çawa dîkare alikariya wan û malbatê wan bîke, wek van pirsan gelek pîrsên dinji, ser wan dan û standin hate çêkirin. Hema dî wê rojê da lî ser zarokên kurd ji hate payivandin, rojnemevan Elin Classon, dî vi wari da baweriyêen xwe diyar kir. Paşê filmê "Welatê Me Kurdistan" hat nişandin, pey

vi filmê zarokên kurd helbes-tên xwe xwendin, koma folklorâ zarokên kurd çend listikê folklorik pêşkêş mîvanan kîrin. Dî vê beşa programê da bî hezaran kesan bala xwe da ser rewşa zarokên kurd û informasiyon girtin.

Paşî ve programa rê rojin, r rojnamek Swêde "Afton Bladet" bî keçeye kurd, BERNA'ye ra hevpeyvinek amadekir û dâ da weşandin. Dî vê hevpeyvina dîrêj da Berna lî ser rewşa Zarokên Kurd lî Kurdistanê, tırsxofêن wan baweriyêen xwe diyar kir.

Bî rasti, dî vê civina zarokan da, gelek milletên biyani lî ser zarokên kurd agahdar bûn û civin bî kîrhati derbaz bû



# 21 SİBAT

## ROJA DIJAYETİA KOLONYALİZMÊ

BRİNDAR

Mê tînkarî û tade dî dema cîvaka koletiyê da derketiye û dî cîvaka Derebegi (Feodali) û cîvaka sermayedariyê (Kapitalizm) da berdewam bûye. Mê tînkarî û koledari dî bergeha bî lînd ya sermayedariyê da (dî dema emperyalizmê da) gihişt pêlikî hartir. Sermayedari dî her dema keysditinê da êriş bîrm ser welatên jar û koloni, bî leşkerêñ xwe mêtînkarî û talanê berdewam kîrin. Bî vi awayi kumek welatên kolonyalist û sermayedar gelêñ Emerika, Afriqa, Asya û gelêñ Rojhilata Navin ji xwe ra kîrin kole û mekanizma koledariyê xebitandin.

Dî dema Emperyalimê da gelêñ jar yêñ cihanê, ji ali welatên kolonyalist va hatibûn parvekîrin û bindestkîrin. Bî vê hawê li gel mekanizma koledariyê, liberxwedana welatên koloni bî xurti berdewam dikir.

Lî aliyê dîn, dî warê parvekîrina welatan dî navbeyna welatên koledar da dijberi derdiketin. Mezinbûna van dijberiyan bûn sedema destpêkîrina şerê cihanê ya yekem.

Piştî şerê duwemin, ku ev şer dî nav emperyalistan da parvekîra welatan bû, emperyalistên koledar ji bo pêkanina listikê nû xebutin. Ji bo wundakîrina

tekoşina diji emperyalizmê, hêzên leşkeri yêñ nû û xurt li dar xîstîn. Bî vê yekê êdi bî awaki din dest bî talankîrîna welatên bindest kîrin. Lê piştî bî serketîna Şoreşa Oktobrê, gelêñ bin dest li diji koledaran bî awaki zanatr rawestiyâ. Gelêñ bindest bî her awayi seri li hember koledaran rakîrin û ew rûreş dikîrin û dîkin.

Bî vê rewşê dî sala 1965 an da 21 ê Sîbatê ji ali Komisyonâ mafêñ mirovati ya Miletêñ bûyi wek rojek navnetewi ya li diji koledariyê hate diyarkîrm.

Kurdistan cîvaka koleti û derebegi jiyaye û heta vê demê hatîye. Dî cîvaka koletiyê da, ku çin derketine holê, gelêñ Kurdistanê gelek imparatori ava kîrine. (Lolobi-Gûti-Kasit-Med-Urartu-Kardaka-Mitan û hwd.) Lê mixabîn iro jiyana xwe dî bin mercen koledariyê da didominin. Gelêñ Kurdistanê weke, ku gelek imparatori ava kîrine, li beri gelek êrişen bîyani ji mane. Gelêñ Kurdistanê tim li hemberi van dagîrkeran rawestiyane. Van êrişan ji ali imparatoriya Roma, Moxol, Yunani, Ereb, ji Selçûqîyan heta Osmaniyan, ji Farisan heta Tîrkan hatine. Lê, bî liberxwedana gelêñ Kurdistanê, ev dagîrkerana ji welê t hatine qewirandîn û kok bernedane.

Dî sala 1514 an de Kurdistan ji imparatoriyêñ koledar yêñ Osmani û Eceman re dîbe qada ser. Ji wê salê û vir de dîkeve pêvajoka koleti û bindestiyê. Dî sala 1639 an de Kurdistan dîbe du parce û dîbe koloniya va imparatoriyan. Her weha gelek welatên dm ji bûn koloniya wan û xwina wan hat rêtin.

Piştî wan salan dî sala 1923' an de dî konferansa Lozan, ê de Kurdistan têñ perçê kîrin û dî nav sinorêñ Turkiyê, Iraq, Iran û Sûri de hêşir dimine. Lê tekoşin û liberxwedana gelê me li hemberi van koledaran ranewestiya ye. Lî Kurdistanê ji bo mafêñ demokratik û nirovati gelek liberxwedan çêbûn, liberxwedanan dan dû hev. Liberxwedanê sedsala 19 an dî sedsala 20' an de ji berdewam bûn û ev şer hê ji li Kurdistanê berdewam in. Iro li her çar ali Kurdistanê tekoşina gelê me berdewam e. Ev tekoşina lîdîji koledariyê wê heta bî dest anîna mafê çarenûsi wê bidome.

21 Sîbatê roja li diji koledariyê bila bîbe nişana liberxwedanê ji bo gelêñ bindest. Dîvê em bî her awayi li vê bîdestxistina zanisti ya çina karkerêñ dînê xwedi derkevin.

--Biji 21 ê Sîbatê roja li diji koledariyê.

**HEVAL CEMİL OZDEMİR  
Lİ SYDNEY ÇÜ HEQİYA  
XWE**

Cemil Ozdemir, endamê Komita Bîrêvebûra Gîsti ya Komela Kurdên Australya roja sê şemê , 8/1/1985 dî qezak tombiliê de lî bajarê Sydney çû heqîya xwe. Bi çûyîna Cemil Komela Kurdên Australya û Kurdistanê şoreşgêreki jir û bi qiret wenda kîrin. Dî hîndir zikê her du salêن bîhûrin de Cemil bê westabûn bo pêşvebirina karê komelê û bo kurd û Kurdistanê xebata xwe berdewam kîr. Hemû Kurdên lî bajarê Sydney, bi çûk û mezînan ve, Cemil wek bîrayek xwe dîditin û ji wi hez dikîrin. Tev ku ew bi hezaran kilomîtir ji welêt dûr bû ji, bindestbûna gelê wi, ew zulma lî Kurdan dibe û ew bêtarêن lî Kurdistanê cih dîgrin bi şev û roj ji bira wi ne dîçû; agirê tekoşînê roj bi roj dî hîndir dîlê wi de gurtir û şîntur dibû. Gor zanebûna xwe, ta ji dest wi dihat der wi bo gelê xwe ta seeta dawê ji jiyina xwe xebatek jir domand. Bi rasti çûyîna Cemil dilên me hemûyan zor şewtand. Lî emê çi bikin; agir têkeve mala mîrînê, wê konê bîrayê me Cemil ji nav me barkîrin da û neda ew merovê welatparêz bo ew xebata xwe ya ji dî salêن têن de bo gelê xwe bidomine. Cemil xanîma xwe, du zarok, heval û hogîrêن xwe û xebatek ji lî dû xwe hîşt. Ruhê bîrayê me Cemil, hevalti û hogîriya wi. wê her dem bi me re bin.

**ŞAHİNE BEKIR**  
Bi navê Kurdên li Australya

# **ÇEND BERHE VOK, DERHEQA KURDAN!**

Mirovêن bi nav û deng derhe3a kurda û Kurdistanê da.

Cihanê da du gel hene kijana dîkarin bikûjin, lê nikarin binine raê. Ew mîlet nîderland û kurdin.

**Ceyms Oldric  
Nîviskarê inglisi komûnist**

Kurd comerdê Rohîlatêne. Her mîreki kurd, lo hela her jîneke kurd bi ruhê xweva helbestvane.

**XACATÛR ABOVYAN  
Himdarê literatûra ermeniye nû**

Rohîlatêda sê helbestvanêن mezîn hene; ew Rûstavêliê gurce, Firdousie farize û Ahmedê Xaniyi kurde.

**H.ORBELİ,  
Akadê mik-kurdzan**

Pirtûka "Folklorâ Kurdmanca'ku Hecîyê Cindi û Eminê Evdal sala 1936 an da hazır kîrine, quranameye.

**MEHMED QAZI  
Serokê Komera Kurdistanê**

Sitiranêن radiyoya kurdî yêن Yêrêvanê dewlemendîya gelê kurdaye û ji sitiranên radiyoyêن kurdi yên mayin delaltur û paqîjin. Ew emekê serok û berpîsyarên radiyoya kurdî Xelilê Çaçan Mûradove, ku ji destpêkêda 1400 sitiran berev kîrine û dane nîvisare.

**QADIR DILAN  
Kompozitorê kurd**

Ermenistana Sovyetistanê benda kurdzaniye lî cihanê gîşki.

**EBDULE GORAN  
Helbestvanê kurdayi bi nav û deng**

Piraniya kurdêن Anatoliya Rohîlatê (Kurdistana Turkiyê) bes tenê guh didîne radiyo-ya Yêrêvanê ya kurdî.

**İSMAYİL BEŞİKÇİ  
Siyasetzanê Turk**

Radiyoya Yêrêvanê ya kurdida 1400 sitiranên kurdî hene. Û eger ji folklorâ kurdî bes tenê sitiran bîmana, disa cihanê bigota ku gelê kurd geleki aqîlmend û jêhatîye.

**XELİLE ÇAÇAN MURADOV**  
Himdar, serok û berpîsyarê radiyoya kurdî, ji sala 1957 an hetani sala 1981 ê.

Berevkir:Tê mûrê Xelil

(Destpêk Rûpel 8'an da)

(berxwedana pêşdaçûna zeviçandinê lî Kurdistanâ Turkiyê).

6- Asteng û perspektivê pêşdaçûna pêşesaziyê.

Hozanê ronakbir dî va pirtûka xwe da 261 çavkani bi pirziman ürîsi, ênglizi, firansi, elemanni, erebi, farîsi, tîrki pêkanîye.

Pirtûk dî aliyê naveroka xwe da pir dewlemende, nîviskar gelek ber xwe daye, ku hemû ali û rudawêن jîna kurd û Kurdistan bi hurgili, bi xwendevanê zîmanên ürîsi bide nasin. Lî, hozan dî dawîya pêşgotina xwe da disan dînîvise, weki ev xebata pirtûka yekemine, ku lî ser hemû aliyêن jîna kurd û Kurdistan rawestiye, ji ber vê yekê, dibe dî va pirtûkê da kêmayı û kurti ji hebin. Ezê pir kêfxwêş bim, ku xwendevan baweriyêن xwe ji lî ser bîdin.

# TAHIR Ü ZAR

A. BALI  
Berlin



Diroka Edebiyata Kurdi bî nivisandin gelek kevne. Lê bes bî gotin hin ji kevnire. Dî nav gelê me da hin tişt hene ku wekû destanin. Sedsalan vir da di nav gel da bî gotin û paras-tina hozanên Kurd heya iro têne gotin. Jî wana hin hatin komkîrinê û hm ji wek Tahir û Zar hin nehatine komkîrin û bî ronahiyê ne ketine. Teknik pêşda dice. Dî vê demê da ew tiştîn me yên diroki bî nivisandin nêne komkîrin roj wê bê ew tiştîn giranbiha wê windabin. Hozanên dî nav gelê me da hin hene û ji wana gelek ji xwendim û nivisandin nizanın. Lê belê destanen ku heta çend rojan berdewam dikun hene bî stran û gotin têngotin. Jî wana Mem û Zin, Siyabendê Sîlîvi û Xecê, Xelil Bego, Hesenik û Asê, Seyid Xan, Eli Xarziya, Dew-rêşê Evdi û hin bî sedan ew destanen cûre cûre lî her ali Kürdistan heye, mirov dikare ku bî nav bîke.

Diroka gelê me dî vê ali da gelek dewlemende. Lê belê kolygonalistan heya iro nehiştine ku bî nivisandin em wana kom-bîkin. Em dikarin bî hêsanî bî-bêjin ku heya yên heyi dijmi-nan windakırine û agir berdane binê wana û ewan şewitandine. Lî bî gotin ne karibûne qede-xe bîkin.

Dî nav van destanen kom-ne-bûyi da, yan ji yên min ne diyin da Tahir û Zarê pêşkêşî xwen-deyan dikim. Ev destana gelek dîrêje. Jî destan çend gotin,

## TAHIR Ü ZAR

Zarê dengeki bang kir  
go gire, gire lo Tahiyo gire . . . .  
Gire, gire lo surguno gire. . . .  
Lo tahiyo tu keremke were

vire

Em ji hevra vekin qu tiya dilan  
Bila derdê dilê te bimire  
Xalik disa li me bûye misafire  
Siyarê xezê, xortê xizire  
Mirazê dilê me tev xwedê kire.  
Digo lo neman, nemam  
Zarê digot: Nemam, nemam  
Lo Tahiyo nemam,  
Ez heliyam bûm ...  
Ax û qûma çiya û çeman  
Te ra bûm pepûka ser keleman  
Ez hêliyam qet tû nemam.  
Lî benda teme  
Lo çeme çeme lo Tahiyo çeme  
Bila agirek mala qêricaliyê  
Go: Tajiyyê revê gihiştin heve  
Ez ji te ra aşîqa diwaneme  
Lo tahiyo gîrbûm lî benda teme.

De haydi haydi Zara te me  
De bani bani lo Tahiyo bani  
Lo ez kewa te me, tu sekmani  
Lo min çiya nehiştin goşt lê  
dani.  
Lo min delav nehiştin av lê  
hilani  
Çima xwedê min û te ra xîrab  
ani.

Lo tahiyo dem û dewrana me  
Lî ser balgiki tev dawi nani  
De haydi, haydi Zara te me  
Jî te ra aşîqa diwaneme.  
Lo tahiyo rê lî dilan nare dilan  
Lo surguno rê lî dilan nare dilan  
Tu ji min ra bû baxçeki sêv û  
gulan

Tu were destê xwe bide min  
Em têkevin çepini herdû dilan.  
Lo Tahiyo wekû xweng û bîran  
Bila kes nizane navbera me  
herdû dilan  
De haydi haydi Zara te me  
De şeve şeve lo surguno şeve  
Were mala me tu rakeve

## AX JI DERDE VAN BEBAXTAN

Jı Diyarbekra qehreman  
 Tê ya dengek kûr û gîran  
 Nalina xortan,  
 Oirina jinan,  
 Axe-kufa belengazan; ax,  
 Van nezanan, van bê bextan,  
 Çıqa paşve mane, ax.

Jı Sowê to ya qehraman  
 Tê ye dengek kûr û gîran  
 Tiji ê ş û jan  
 Jı derdê dizan;  
 Dîbin ser û binê erdê ; ax,  
 Ax.....

Jı Selvedora qehreman  
 Tê ye dengek kûr û gîran;  
 Faşist har bûne,  
 Dirjinin xwinê  
 Nedîzanin mirovtiyê ax  
 Ax.....

Jı filistina qehreman  
 Tê ye dengek kûr û gîran;  
 Jînek dîgrî,  
 Lawîk mîri ye  
 Ew ji wek bavê wi kuştin ax  
 Ax....

Jı Mehebata qehreman  
 Tê ye dengek kûr û gîran,  
 Mîndal sê wine  
 Oirin û şîne  
 Bavê n mîrxas canfida bûn, ax  
 Ax....

Lî hemûbeşen cihanê  
 Wek gelê me Kurdistanê  
 Hînek dîgrine,  
 Bîrçi û tîne  
 Hin ji iroj hin bîdestin, ax  
 Ax....

## KALEMERE KURD

Mame belengaz  
 Kalemê rê Kurd  
 Ez ji her tiştî  
 bê par hîştîme  
 Hebûnê n mîn tev  
 ji xwer birûne  
 Ez dizanîm  
 Ez dîbinîm  
 Ez dizanîm xwedi neft im  
 Dizanîm  
 xwedi zêr û ziv im  
 Ez dizanîm welatê mîn  
 ji her welati dewlemend tir e  
 Ez dizanîm em geleki kevnar  
 ji yêñ cihanê ne  
 Lê çîbkîm! Em iro lî bin lingan  
 û lî bin destan in  
 Nezani û pîrbendiyê  
 serê me xwariye  
 Jı vê yekê Kurd lî bin destan  
 û xîzan in  
 Jı van derdan  
 Jı van ê ş û bîrinan  
 Jı van xem û ramanan  
 Min riha xwe spi kîriye  
 Jı kul û derdan spi bûne  
 mûwê n laşê mîn  
 Le ez dizanîn dînya bî rîz e  
 Ez dizanîn ev rewş weha nameşe  
 Ez dizanîm rojekê wê welatê mîn ê şîrin  
 serbixwe û gelê n me azad bin  
 Ez dizanîm dem ji dema rojek  
 roja me heye  
 Xwezi mîn bîdita Kurdistanâ rengin  
 We derketana ji dîl kul û keder û brîn  
 Gelo heye ku bîbinim bî çavan?  
 Mal û can seri jê re bî heyran  
 Bîla her hebe, her bîji KURDISTANA  
 KURDAN !

# JI BİR Ü RAYA GIŞTİ RE

Dı dawiya sala bori zarokxanak Kurdan lı Tenstayê vebû û 15 zarokên Kurdan dest bı vê zarokxanê(Daghêmê) kırın. Vebûna vê zarokxanê dı demek kurt de bala hukûmeta Tirkiyê û sixurên wan yên lı Swêdê kışand û ew ne rehet kırın. Lê belê bûyer, bes bı ne rehetiyawan ne ma. wek tê zanin Hukûmeta Tirkiyê, ji Hukûmeta Swêd bı hawaki fermi, ango resmi daxwazkir ku vê zarokxana Kurdan bigirin. Ev daxwaza Hukûmeta Tirkiyê dı meha Çileyê Paşin de dı rojnama Svenska Dagbladet de, ji devê Konslosê wan hate eşkere kırın. Dı beyana xwe de Konsolos dîgot ku, lı Tirkiyê bes zimanek heye û ew ji Tirkîye. Dû re konsolos, bala Hukûmeta Swêd bı zimaneki "diplomatik" dikışand û daxwaz dikir ku vê zarokxanê bigirin.

Lı ser vê daxwaza Hukûmeta Tirkiyê hetani nuha tu berpirsiyareki Hukûmeta Swêdê tu beyan ne dan û ditinêñ xwe eşkere ne kırın. Bes dı der heqê beyana Konsolosê Tîrkan de, Şefê Socialê Ove Radberg beyanek da rojnama Dagens Nyheterya herêmi. Ove Radberg dı vê bayana xwe de bı xurti lı dij daxwaza Tirkiyê derdikeve û dibê ku wê ev zarokxane wek yên hemû biyaniyan her biji û emê ji alikariya xwe pê re bidin domandin.

Ev daxwaz û êrişa Tirkiyê, lı hember me hemû Kurdêñ welatparêz, pêşverû, bı rexistin û bê rêxistin e. Dema ku em vê bûyerê biçük bibinin, yan ji dı ser guhêñ xwe re bavêjin, wê demê wê Tirkîye cesaretê bigre, ku hin daxwazêñ din ji, ji Hukûmeta Swêdê bike. Lewra ji divê em lı hember vê yekê, lı hember vê daxwaza lı dij mafêñ mirovi derkevin û dengêñ xwe bı xurti bilind bikin.

## EMÊ ÇAWA DENGÊ XWE BILIND BIKIN ?

Bê guman dîvê lî dij vê êrişa Hukûmeta Tîrkan bê derketin. Dî vi wari de ne hewceye ku mirov dûr û drêj lî ser fêde û pêwistiya vê yekê bisekine. Jî ber ku bûyer, gelek eşkereye: Hukûmeta Tîrkiyê dixwaze mafeki me yê insani û demokratik li vir ji dest me bîde girtin. Yê dikeve ser milê me ji eve ku, em jî vi mafê xwe biparêzin û lî dij vê êrişa Tîrkiyê derkevin. Lî, çawa û bî çî hawi?

Bê guman dî vi wari de wek hemû rêxistin û komeleyên Kurd, bareki mazin dîkeve ser milê Federasyona Komelêن Kurdistan ji. Divê Federasyon bê deng ne mine û lî hember vê daxwaza Hukûmeta Tîrkan bî xurti derkeve û dengê xwe bigihine meqamên swêdiyan. Lî ser vê bir û baweriyê Federasyona me, dî kongra xwe ya 5'an (26/27.1.1985) de ev bûyer girte rojeva xwe û bî nûnerên Kongrêva lî ser sekini, pêşniyar û ditinêñ nûneran girt. Dî dawiyê de Kongra me lî ser vê yekê hin bîyar girtin. Bîyarêñ ku Kongrê girtin ev bû:

Divê Kongre, jî Hukûmeta Swêdê û Parlementoyê re têlgirafekekê bisine û jî wan daxwaz bike ku ew, vê bûyerê bîncil nekin, lî dij daxwaza Tîrkiyê derkevin û rewşa xwe diyar bikin.

— Divê Kongre, jî parlamente Û VPK Oswalt Soderquwist re têlgirafeke bisine û jî Oswalt daxwaz bike ku ew, vê bûyerê bî riya partiya xwe bibe parlementoyê û di parlementoyê da lî ser bê te axaftin.

— Divê Kongre, jî Şefê Social Byra Ove Radberg re jî bona beyana wi ya rojnamê sîpasnamakê bisine û jî bo piştgiriya wi jê re sîpas bike.

Piştî Kongrê, Komita Kargeri Fedarasyonê ya nû ev her sê bîyarêñ Kongrê bî cih ani, ango jî Hukûmet, Parlamento, Oswalt û Ove Radberg re têlgiraf şand û jî wan ev daxwazêñ jorin kîr.

Bê wan her sê bîyaran, Kongrê bîyarek dîn ji girti bû, ku belavokekê jî birûraya giştî re belav bike û jî hemû Kurdêñ pêşverû welatparêz van daxwazêñ jêrin bike:

a) Kongra Federasyona Komelêن Kurdistan ya 5' jî hemû rêxistin, komela û Kurden pêşverû, welatparêz daxwaz dike ku ew jî Hukûmet û parlemento yê re têlgrafan (Naman) bisinin û jî Hukûmet û Parlamentoyê daxwaz bikin ku ew, dî vê bûyerê de bê deng ne minin, ditinêñ xwe eşkere bibêjin û lî dij daxwaza Hukûmeta Tîrkiyê Derkevin.

Divê her rêxistin, komel û hemû Kurdêñ pêşverû û welatparêz jî Oswalt Soderquwist re têlgrafan bisinin û jê daxwaz bikin ku ew, vê bûyerê bî riya partiya xwe bibe parlementoyê.

b) Cardîn divê her rêxistin, komel û her Kurdeki pêşverû û welatparêz, ji Şefê Social Byra ya tensta Ove Radberg re têlgrafan bisinin. jî bo beyana wi jê re sîpas bikin û piştgiriya xwe nişan bîdin.

Em, (Federasyona Komelêن Kurdistan) bî vê belavokê, vê bîyara Kongra ji bî cih tinim. Û em hêvi dikin ku, wê her Kurdeki welatparêz wê dî ber xwe re name û telgirafan jî Hukûmetê û lî dij êrişa Tîrkiyê derkeve.

Çawa ku hin daxwaz û hêviya her Kurdeki jî Fedarasyonê heye, her wîsa hin daxwazêñ Federasyonê jî jî Kurdêñ lî Swêdê dijin heye. İro roj, roja kuem dengêñ xwe bî hev ra bîlind kîn û lî dij vê erişa Tîrkiyê bî hev re derkevin.

www.arsivakurdi.org

ADRESS/NAVNIŞAN:

RISSNELEDEN 55,NB  
172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN

MASSKORSBAND

